

Herwiha bernameyeke piştevaniyê heye ku arîkariya gel dike jiyana xwe ji nû ve çêbikin. Ev bername arîkariya kesên dike ku cihekî ewle bo jiyana peyda bike, piştevaniyê dike muqatebûnên bijîşkiyê, rawêjkarî û hevpirsîna hiqûqî û koçberiyê, piştevaniya malî hebin, bo perwerde û hînkirinê yan peyda kirina kar, û têkiliyên civakî arîkariyê dide. Xaça Sor dikare li bara vê bernameyê agahiyên pirtir bide.

Wezareta Xizmetên Civakî li Bernameya Piştevaniya Kesên Qaçxubûyî xercê vê xebatê dide.

**Bo agahiyên bêtir yan hevpirsîna neêşkere, ji kerema xwe bi Xaça Sor a Avûstrlyayê re pêwendiyê çêbikin.**

T. 1800 113 015

E. [national\\_stpp@redcross.org.au](mailto:national_stpp@redcross.org.au)  
[redcross.org.au/workrighthu](http://redcross.org.au/workrighthu)

*This Modern Slavery grant activity received grant funding from the Australian Government.*



# Koletiya nûjen li Avûstrlyayê rûdide



Eger hûn yan kesekî hûn nas dikin li ser kar tê behre wergirtin, em dikarin arîkariya we bikin.

# Divê li ser kar bi we re baş reftar bibe.

Hemû karkerên li Avûstrlyayê mafên wan ên bingehîn hene ku qanûn wan diparêze. Ev qanûn bo hemû karkeran e hetanî yên ji welatên derve, bêyî ku guh bide qasa mayîn an cûreya vîzaya wan li Avûstrlyayê.

Behre wergirtina giran li kar li Avûstrlyayê sûcekî giran e.

## Eger hûn yan kesekî hûn nas dikin:

- Neçar bibin kar bikin an ser karî ewle nebin
- Gelek saetan kar bikin bêyî ku bêhna xwe vedin
- Diravê kesekî rast nedin
- Diravekî deyn ê mezin bidin bo bikarhêner an karsazekî ji ber sefer, mayîn, cil û kinc, xwarin, çûyînhatin an belgeyên karkirinê
- Nikaribin cihê xwe yê karkirinê biterikînin an ser mercan gotûbêj bikin
- Li ser karî gef an tirs ser kesekî hebe, wekî bibêjin hûn ê bi paş ve werin vegerandin yan endamên malbatê dê zîyanê bibînin
- Nikaribin xwe bigihînin pasaporta xwe yan belgeyên din ên pênaseyê
- Li mala kesekî kar bikin û gelekî kêr bikarin biterikînin

## Arîkarî mimkin e.

## Çawan arîkariyê wergirin

Xaça Sor hevpirsîn û piştevaniyê dike, û dikare bo arîkariyê we bişîne beşên din ên xizmetê. Xizmeta wergera devkî heye.

Ji 03 9345 1800 re telefon bikin an e-name bikin bo [national\\_stpp@redcross.org.au](mailto:national_stpp@redcross.org.au)

Bo agahiyên li bara mafên cihê xwe yê kar, hûn dikarin serdana [www.fairwork.gov.au](http://www.fairwork.gov.au) bikin, yan bi 13 13 94 ji Fair Work Ombudsman re telfon bikin.

Eger pêdiviya we bi wergêrê devkî heye, bi 13 14 50 ji Beşa Wergera Nivîskî û Devkî re telefon bikin.

Eger lezgîn be yan ser ewlehiya kesekî gef hebe bi 000 ji polis re telefon bikin.

Bo raporkirina mijareke ihtimalî ya koletiya nûjen bi 131 237 ji Polîsê Federal ê Avûstrlyayê re telefon bikin.